

Bultena Rêxistîna Ewrûpayê ya Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê

## Yekîtiya Sosyalîstan gav bi gav tê hûnandin

Platforma Yekîtiya Sosyalîstan li gor teqwîma ku daye ber xwe, pirsên li pêşya yekîtiya siyasî û rêxistinîyê yek bi yek, çareser dike û di rîya kongreyeke hevbeş de bi gavên ewle dimeşe. Ji bo Platforma Yekîtiya Sosyalîstan qonaxa tesbîtkirin û plankirina karên teorîk û pratîk hatiye derbaskirin, nuha bicihanîna karên ku hatine dest nîşan kirin û plankirinê di rojevê de ye.

Xebatên yekîtiyê bi civîna yekem ku di 07.09.1993'an de di navbera RNK, TSK û YEKBÛNê de çêbû, dest bi xebatên xwe kir. Lê ev xebat di meha Nîsana 1994'an de ji bo raya giştî hat diyarkirin. Piştî çend civînan ' hersê alî li ser çarçove û karektera yekîtiya siyasî û rêxistinî yê li hevdu kirin û di vê derheqê de bi navê "Tesbîtên Hevbeş yên li ser Awa û Karektera Yekîtiya Rêxistinî û Siyasî" metneke hevbeş pêşkêşî raya giştî kirin. Hêvî ew bû ku pîrsa yekîtiyê di havîna 1994'an de, bi kongreyeke hevbeş bête çareser kirin. Lê ji ber hin sedeman ev kar pêk nehat. Di Îlona 1994'an de Kongreya Duyem a Partiya me çêbû. Di kongreyê de, li ser pîrsa yekîtiyê, biryar û hewldanên Partiyê hatin pejirandin û ji bo firehkirina wê biryar hat girtin. Piştî Kongreya me kar û barên yekîtiyê di navbera RNK, TSK û YEKBÛN'ê de dom kirin û him jî her sê alî ji bo firehkirina vê platformê xebitî. Di vê navberê de her sê aliyan ji bo munaqeseyan, di warê programa yekîtiyê de pêşniyarek amade kirin. Di 20'ê Çiriya Paşîn de li ser pêşniyara RNK, TSK û YEKBÛNê, platforma yekîtiyê ya ku ji hersê hêzan pêk dihat, bi platforma Kawa û TS'ê re şertên yekkirina her du platforman ava kirin û bi vî awayî herdu platformên yekîtiya sosyalîstan gihîştin hevdu. Platforma nuh ne ji destpêkê, lê xebatên herdu platforman ji xwe re wek bingehê qebûl kir û organîzekirina karûbarên yekîtiyê ji qonaxên ku herdu platform gihîştubûnê domand. Ev helwest di vê pêvajoya amadekirina şertên yekîtiyê de, wek nîşana samimiyeta hêzan hat nîrxandin û atmosfera baweriyê xurttir kir.

Îro li ser pirsên sosyalîzmê û hemû meylên ku di vê çarçoveyê de têne hesabkirin, munaqeseyên pirrêhêl tên kirin. Dinya di vî warî de pêvajoyeke bi libat dijî. Ev munaqese hem di navbera parêzgerên fikra sosyalîzmê û yên wek felsefe li dijî wê, hem di navbera hêzên cûda yên sosyalîst û hem jî di hundurê

yek bi yek hêzan de tê kirin. Gava rewş weha be, wek Sekreterê me yê Giştî Birêz E. Serdar Dilan jî gotiye, em kes û hêzên ku xwe sosyalîst dibînin, ji bo çî dê nikaribin di bin şemsiyeya eynî rêxistinê de jî van munaqeseyan bidomînin?

Bi huwiyeteke sosyalîst mudaxeleya pêvajoya îro, wek berpirsiyariyêke dîrokî li ber me ye. Ji bo pêkanîna berpirsiyariya dîrokî û di şikildana pêşerojê de peydakirina şeklê xurtbûn û giraniyêke mezin a sosyalîstan, divê di bin tecrûbeyên dîrokî yên ku ji me hemûyan re bi faturayên giran bûne mal

de, avêtina gavên pêwîst, li benda tu tiştî nemînin. Jiyan bi hereket e ji bo hêzên sosyalîst jî bikaribin tesirê li vê hereketbûna jiyane bikin û şertên pêkanîna armancên xwe amade bikin, divê di nava refartiyên ku bi hereketbûna jiyane û bi karektera dîrokî ya ku tê jiyin re li hev kirî de bin. Na na, jiyana va-labûnê nas nake û ne li benda sebra sosyalîstan û ne jî li benda ya kesekî din dimîne.

Îro civata me, di warê siyasî de bê balansiyêke mezin diji. Ev tesirê li ser amadekirina şertên yekîtiya hêzên ne-  
*Dûmahîk. r. 11*

## Vatiniyên ku li benda me ne

Gelî hevvelatîyên hêja;

Me saleke bi êş û giran derbas kir. Mixabin sala 1994'an ji gelek hêlan ve, ji bo gelê me saleke xerab bû. Dijmînen gelê me, dewletên kolonyalîst, dewletên ku welatên me perçêkirine, lê tehakumê dikin û me ji hemû mafên me yên neteweyî bêpar kirine, zulm û zordariya xwe bi awayekî bêperwa didomînin. Ev êrîş dibe êşek li ser dilê me Kurdên li derveyî welêt.

Kurdîstana Bakur ji roja avakirina Cumhuriyeta Tirkîyeyê û vir de, rewşa xwe ya herî xerab dijî. Dewleta Tirk ji sisiya duduyê leşker û hêza xwe li Kurdîstanê bi cih kiriyê, welatê me gund bi gund ji nuh ve îşgal dike. Hin gundan ji binî ve hildiwêşîne, hinan nîv-vala dike. Heroj duyê reş yê şewata gundekî an çend gundan hildikişe asîmana. Hejmara gundên şewitî li gor reqemên dewletê 2000'î der-

bas dike. Di van sê salên dawiyê de, ji 2 milyon zêdetir xelkê me dev ji cî û warên xwe berdan û koç kirin. Di van 10 salên dawiyê de, bi destên hêzên dewletê ji 10 hezaran zêdetir Kurd hatin kuştin. Dewletê bi navê "cînayetên qisas nediyar" 3000 mirovên Kurdperwer di ro-nîvro de li kolanên bajarên kuştin. Ne pêwîst e em zêdetir qala zulm û politikaya dewletê ya hov û barbar bikin. Hun bi xwe, bi çuyin û hatinên xwe, bi çavên xwe dibînin, bi telefon û danûstendinên rojane, dibihîzin.

Hemvelatîyên hêja;

Divê em li hember vê wehşeta dewleta Tirk bédeng nemînin. Qehir û êşa xwe bi hiş û mêjiyekî xwînsar, bi praktîkeke bi plan û program, derxinin holê. Divê mirov dengê xwe li dijî vê zulm û terora dewleta Tirk, bilind bike.

*Dûmahîk r. 11*

**Em Newroza hevvelatîyên xwe yên  
li derveyî welêt bi hêviya aşîtî  
û pêşerojê ewle pîroz dikin !**

**Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê**

# Xebata cephê têk çû, lê hewcedariya wê ma

**X**ebata Platforma Cepheya Neteweyî û Demokratîk a Kurdistanê Bakûr di 02.02.1995'an de hate rawestandandin. Weke tê zanîn, ev xebat di meha Hezîrana 1993'yan de dest pê kiribû û 12 rêxistinên siyasî yên Kurdistanê Bakûr ji bo avakirina cepheyê neteweyî dest bi xebateke mustereke kiribûn. Destpêka xebata avakirina Cepheyê berê li welatê me û dû re li dinyayê jî di nav dostên gelê me de, kêfxweşiyê mezin peyda kiribû. Vê xebatê hêviyên biserketina têkoşîna me ya neteweyî û demokratîk jî xurttir kiribû. Bê guman ev yek, ji ber ku destpêka xebata avakirina Cepheyê bersiva daxwaz û pêwistiyeke girîng û bingehîn a têkoşînê bi cih dikir, dihat holê. Loma jî, ew beyana ku li ser rawestandina xebata platforma cepheyê, daxwaz û hêviyên ku ji hêzên siyasî û neteweyî dihat kirin, qelstir kir.

Helwesta Partiya me li ser awayên yekîtiya neteweyî û her wisa li ser cepheya neteweyî û demokratîk diyar e. Partiya me, ji roja avabûna xwe û heta îroj, hertim peydakirina mercên avakirina cepheyê neteweyî, ji bo temsîla îradeya siyasî û neteweyî ya têkoşîna gelê me, weke pêwistiyeke bingehîn a serkevîtinê nixandiyê û helwest û hewildanên xwe yên siyasî û pratîk jî li gora vê pêwistiyeke tesbit kiriyê. Loma jî, biserketina vê xebata ku nêzî du salan ajot, ji bo me bûyereke girîng e. Her çend, dîtîna û hewildanên Partiya me yên li ser xebata platforma cepheyê bi munasebetên cuda û rêyên cuda ve, hem di hûndûrê Partiyê de û him jî ji bo raya giştî hatibe diyarkirin jî, pêwistiya munaqeseya vê pirsê bi aliyên xwe yên cuda ve jî holê ranebûye. Ji ber ku, cepheyê neteweyî, dezgehê e û pêwistiyeke stratejîk a biserketina têkoşîna neteweyî ye.

Li ser sedemên biserketina xebata du salan ku di meha Sibata 1995'an de hate rawestandandin, gelek tişt dikare bêne gotin. Lê ya girîng ew e ku ev sedemên bingehîn bêne tesbit kirin, da ku rê ji çareserkirinê wan asteng û sedemên bingehîn re bêne dîtîna. Metodeke din a munaqeseyê, wê bi tenê bibe gazindên giştî û bi vî awayî jî dê tu tişt neyê guherandin. Ji ber vê, di gelek agahdarî û beyanên Partiya me de hatiye diyarkirin ku helwest û dîtîna teng û xweperestên PKK'ê li ser avakirina cepheyê, fonksiyona wê, daxwaz û hêviyên ku ji cepheyê neteweyî tê kirin, bûye sedema bingehîn a biserketina vê xebatê. Ew dîtîna û helwestên PKK'ê jî bi kurtî ev in;

- PKK bi xwe, di warê avakirina Cepheyê de, dîtîneke klasîk ji xwe re kiriyê esas, ku tu elaqeya vê dîtîna bi rastîya siyasî ya Kurdistanê re tune ye.

Wê bi xwe cepheyê bi navê "ERNK" ava kiriyê. Loma jî ew cepheyê neteweyî ku bi maneya xwe ya esasî divê ji aliyê hemû hêzên siyasî-neteweyî yên Kurdistanê Bakûr ve bê avakirin, dixwaze ji xwe re weke taktîk bi kar bîne. Ev dîtîna û helwestên PKK'ê di gelek nivîs û pêwendiyên wan de eşkere ye.

- Li aliyê din, PKK desthilatiya cepheyê neteweyî, bi tenê weke dezgeh û desthilatiyeke diplomasiyê dibîne. Ew bi xwe, ji bo di her pirs û awayên xebata siyasî û neteweyî ya tevgera rizgariya neteweyî ya Kurdistanê Bakûr de cepheyê desthilatdar ava bibe û ew jî perçeyê wê be, ne amade ye.

- PKK, cepheya ku divê ji aliyê hêzên siyasî-neteweyî yên cuda ve bê avakirin, weke dezgehê ku divê "rastî" û "xurtiya" PKK'ê tesbîl bike, dibîne. Cepheyê, weke lihevhatineke siyasî ku li ser bingeha xal û hedefên neteweyî yên hevbeş bê avakirin û bibe temsîla mustereke a îradeya neteweyî ya gelê Kurd, nabîne.

**L**i gel van xalên bingehîn ku li jor hatin diyarkirin, bi hêzên û pîralîbûna xebata PKK'ê, girîngiya dîtîna û helwestên PKK'ê di avabûn an jî neavabûna cepheyê neteweyî de, zêdetir dike..

Li vir, pîrseke girîng heye ku divê tevgera neteweyî bikaribe jê re bi awayekî giştî bersivê peyda bike. Gelo, ew hêzên ji derveyî PKK'ê çima nikarin yan jî nikaribûn di navbera xwe de cepheyê ava bikin? Yan jî yê avabûyî çima bi ser neketin? Diyar e, pîrseke wisa di cihê xwe de ye. Hem, tecrubeyên berê, hem jî yê dawîyê diyar dîke ku cepheyê ku bikaribe daxwaz û hêviyên jê tê kirin, bi cih bîne, divê li gel hin xalên din, tevahiya hêzên siyasî-neteweyî yên Kurdistanê Bakûr hembêz bike. Loma jî, her çend ew pîrsên ku hatin diyar kirin di cih de bin jî, helwesteke wisa bersiva pêwistiyan armancên me yên hevbeş, çareserkirina

*Partiya me, wê helwest û hewildanên xwe yên ku PKK jî tê de, bi hemû hêzên siyasî-neteweyî re avakirina cepheyê neteweyî bidomîne.*

*Ev helwest û hewildanên me, ji daxwaz û pêwistiyan rewşa welatê me tîne.*

pîrsa neteweyî ya gelê me, nadin. Em îroj bi kêmanî ne di rewşê weha de dijîn. Loma jî, Partiya me, wê helwest û hewildanên xwe yên ku PKK jî tê de, bi hemû hêzên siyasî-neteweyî re avakirina cepheyê neteweyî bidomîne. Ev helwest û hewildanên me, ji daxwaz û pêwistiyan rewşa welatê me tîne. Diyar e ku ger hêzên din rêyêke wisa bidin pêş xwe, mumkun e ku bikaribin di nav xwe de cepheyê ava bikin. Lê gaveke wisa çiqas fireh be jî, wê gaveke kême be û wê bersiva pêwistiya rewşa welatê me û pîrsa bingehîn a gelê me nede. Di cepheyê neteweyî de, cihê her hêzeke siyasî-neteweyî heye û ev yek pêwistiyeke girîng a biserketinê ye. Divê em di her qada jiyane û awayên xebatê de, xebat û hewildanên xwe yên ji bo xurtkirina bingehên avakirina dezgehên yekîtiya neteweyî bidomînin. Loma jî hêvî û daxwaz ew e ku, divê PKK di warê avakirina dezgehên yekîtiya neteweyî de, dev ji dîtîna û helwestên xwe yên teng, taktîkî û xweperstî berde, da ku bi beşdariya hemû hêzên siyasî ve, dezgehên neteweyî yên pêwîst bêne avakirin. Berjewendiya tu hêzan û ya têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê Bakûr, di berdewamiya vê rewşê de tune ye.

## Tûrîzma Tirkîyeyê boykot bikin

Almanya- Îsal jî li Almanyayê wek hersal kampanyaya li dijî tûrîzma Tirkîyeyê hat vekirin. Di vê çarçoveyê de, di meha Sibata de li Hamburgê civînek hat amadekirin. Gelek komele û dezgehên Kurd bi hevdu re platformek ava kirin. Di nav vê platformê de HEVKAR jî heye.

Platformê di warê boykotkirina tûrîzma Tirkîyeyê de belavokek belav kir û di 11'ê Sibata de jî mitîngê li dar xist. Mitîng li ber Fuara Hamburgê ku mal û tûrîzma Tirkîyeyê dida nasîn, çêbû.

Di axavtîna li ser navê amadekarên mitîngê de, li ser şerê dewleta Tirk ê ku li Kurdistanê hemû gelê Kurd daye ber xwe, hat rawestîna û hat diyarkirin ku hatîna jî tûrîzmê, di vî şerî de rola mezîna dileyize.

Ji ber vê yekê, ji bo biserketina helwesta li dijî vî şerî û rawestandina xwîna ku li welatê me diherike, ji hemû kesên mirovperwer daxwaz hat kirin ku divê ew li dijî tûrîzma ku yek ji wan finansmanê vî şerî ye, derkevin.

# "Parlamamentoya surgunê" û ezîtiya siyasî

Di 14'ê Çileyê paşîna 1995'an de li bajarê Brukselê, bi beşdariya ji wan berpirsiyarên ERNK Elî Sapan û çend nûnerên DEP'ê; serokê kevn Yaşar Kaya û parlamenterê Wanê Remzî Kartal ve, "Komisyona Amadekar a Parlamentoya Surgunê ya Kurdistanê" (KA-PSK) di konferansekê çapemeniyê de ji bo raya giştî hate diyarkirin. Her wisa, deklarasyona "Armançên Avakirina Parlamentoya Surgunê ya Kurdistanê" jî ji raya giştî re hate belavkirin.

Parlamento, organeke qanûndanîne ye, ku divê bi kêmanî bi îmkana beşdariya her aliyên siyasî yê civatê ve bê avakirin û divê endamên wê jî bi wî awayî bêne tesbîtkirin. Diyar e ku, em weke netewe ji îmkaneke wisa bêpar in û loma jî dezgeheke wani, yanî ya li ser her organ û dezgeheke îcraatê û yek bi yek rêxistinên siyasî be, îroj yekser bi awayê dengdanê nikare bê avakirin. Lê weke ku gelek tevgerên rizgarîxwaz ên neteweyên bindest, bê guman Kurd jî dikarin di dema têkoşîna bidestxistina mafên xwe yê neteweyî de organ û dezgehên neteweyî ku îrada siyasî ya gelê me û tevgera rizgarî ya neteweyî temsîl bike ava bikin. Cepheyeke neteweyî yek ji wan awayên dezgeha yekîtiya neteweyî ye. Parlamento jî weke ku li jor jî hate behskirin, îro her çend yekser bi beşdariya gel ne mumkun be jî hin rêyên din dikarin bîne tesbîtkirin û bi wî awayî tev her kêmasiyên xwe, bê avakirin.

Divê em hewildanên avakirina "Parlamentoya Surgunê ya Kurdistanê" (PSK) jî bi van pîvanên esasî yê li ser fonksiyon û awayê avakirina parlamentoyan binirxînin û helwesta xwe tesbît bikin.

Weke ku hate gotin, Parlamento dezgeheke qanûndanîne ye û temsila iradeya siyasî ya neteweyekî dike. PSK (Parlamentoya Surgunê ya Kurdistanê), bi armançên ku di deklarasyonê de hatine nivîsandin, nikare vê pîvanê bi cîh bîne. Beriya her tiştî, endamên KA-PSK di dîtîna û beyanên xwe de, vê dezgehê jî bo çî ava dikin, ne zelal e. Geh dibêjin "ji ber ku Dewleta Tirk, mecal nade ku Kurd di Parlamentoya Tirk de bixebitin" ev pêwisti derketiye holê, geh dibêjin "PSK dê tevgera rizgariya neteweyî di qadên navneteweyî û diplomasiyê de temsîl bike, piştgiriya wê bike û wê pêşve bibe", geh dibêjin "dê bi pirsên siyasî, civakî, aborî, çandî û perwerdeyî yê Kurdistanîyên li derveyî welêt mijûl bibe". Û dewam dikin, "PSK dê gava yekem ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê be. Dê, berjewendiyên neteweyî esas bigre, ji tevahiya hêz û dezgehên neteweyî ku di nav gelê Kurdistanê de xwediyê temsiliyekê nin, re vekirî be. Ji bo ci-

vandina Kongre û Parlamentoyeke neteweyî ku sewiyeyeke bilind e û tevahiya neteweyê hembêz bike, berpirsiyariyên xwe bi cîh bîne". Dema mirov van rêzan teva, di deklarasyonê de dixwîne, pirsê yekem a ku derdikeve holê ev e, gelo endamên KA-PSK bi rastî jî hewcedarî alikariyê ne ku fêrbîbin parlamento çî ye, ne çî ye? Eger ewê jî bo meclîseke neteweyî kar bikin, gelo çima nuha "Parlamentoya Kurdistanê" li surgunê ava dikin?

Bê guman tevlihevî, nezelalî û pirsên hewcedariya bersivan, ne bi tenê ev in. KA-PSK dibêje ku, "PSK îradeya hîlbijartî ya gelê me yê him li welêt him jî li derveyî welêt îfade dike" û dî re weha dibêjin; "Ji ber ku, li welêt gelê me ne xwediyê mercên hîlbijartîneke azad e, dê nûnerên xwe li bin kontrolê û bi wasitêya dezgehên neteweyî, li surgunê, hîlbijere". Dema mirov, ne ji pêwistiyan, lê ji hin berjewendiyên şexsî, grupî yan jî rêxistinî hereket bike û ji her tiştî girîngtir jî, ne bi îradeya xwe, lê bi hin talimatan bi lez û bez "dezgehên neteweyî" ava bike, encama wê ev rêzên li jor in. Di navbera van rêzên jorîna de jî xwe dê kî bibe endama/ê vê "parlamentoyê" hatiye nivîsandin.

Li gel van nezelalî û tevliheviyên fikrî, hem jî bo endamên KA-PSK û hem jî raya giştî ya welatê me tiştekî pîrr zelal û eşkere heye. Ev jî, avakirina "PSK"ê bi biryara rêxistîneke siyasî, ango PKK'ê ve destpêkirîye û endamên KA-PSK jî li gora vê rastiyê hatine tesbîtkirin.

Gelek aliyên vê pirsê hene ku pêwîst e bîne zelalkirin. Yek ji wan aliyan jî,

ew e, gelo hêzên siyasî yê Kurdistanê Bakûr di nav xwe de dema hîn cepheyekê ava nekiribin, dê çawa "Parlamentoya Kurdistanê" ava bibe? Yê ku xwe nadin ber cepheyeke neteweyî dê çawa bikaribin "Parlamentoyeke Neteweyî ya Kurdistanê Bakûr" ku divê bi beşdariyeye fireh -ne bi tenê rêxistinên siyasî lê her wisa bi beşdariyeye fireh ya rêxistinên demokratîk, meslekî û hwd- pêk bê, ava bikin?

Eşkere ye ku dezgeha ku bi van tevliheviyên fikrî û bi biryara rêxistîneke siyasî bi tenê bê avakirin, dikare bibe her tişt, lê nikare bibe "Parlamentoya Kurdistanê". Parlamentoyek ku li ser bîngeha hemfîkrî û beşdariya tevahiya hêzên siyasî-neteweyî yê Kurdistanê pêk neyê, nikare bibe "Parlamentoya Kurdistanê" ku îradeya siyasî di sewiya neteweyî de temsîl bike. Ji xwe, avakirina "PSK"ê dezgeheke surgunê ava dikin. Ne dezgeheke neteweyî ku ji ber rewşa welatê me, îroj bi tenê LI SURGUNÊ dikare pêk bê, ava dikin. Tevera rizgariya neteweyî ya Kurdistanê Bakûr, mecbûr e ku dezgehên yekîtiya neteweyî ava bike. Ev pêwîstiyek e. Loma jî, pêwîstî bi "parlamentoyeke surgunê" tune ye. Ya pêwîst Parlamentoya Neteweyî ya Kurdistanê Bakûr e ku bi tenê bi avabûn û inisiyatîva cepheyeke neteweyî ya di navbera hêzên siyasî-neteweyî yê Kurdistanê Bakûr de dikare bê avakirin. Divê em xebat, hewildan û têkoşîna xwe, bi van armanç û awayan ve bidomînin. □

## Meşaleya 8'ê Adarê bighînin agirê Newrozê

*Kurdistan- Jinên Neteweyî yê Şoreşger bi munasebeta 8'ê Adarê li gelek bajarên Kurdistanê belavok belav kir. Di belavokê de li ser mana 8'ê Adarê tê rawestandîna û bi awakî giştî rewşa jinên Kurdistanê tê zimên.*

Belavok behsa rewşa xerab a Kurdistanê dike û di vê rewşê de li ser erkên jinên Kurd diçekîne û weha dom dike:

"Azadbûna jinên Kurd û gîhaştina hemû mafên xwe, bi azadbûna civatê re paralel e. Heta gelê me jî bin nîrê kolonyalîzmê rizgar nebe û negihîje azadî û serxwebûna xwe, jinên Kurd jî bi tem-

ami azad nabin. Lê tespîtkirina vê rastiyê, nayê wê maneyê ku wê jinên me jî bo hin mafên xwe yê rojane tenekeşin; tenekeşîna jî bo bidestxistina her mafî, wê dinamîzmê bide tenekeşîna gelê me ya jî bo rizgariya neteweyî û civakî..."

Belavok bi van gotinan diqede: "Em wek Jinên Neteweyî yê Şoreşger, tenekeşîna bi ezîm ya li dijî kolonyalîzmê, faşîzmê, emperyalîzmê û hemû rengên paşverûtiyê, jî bo meşala 8'ê Adarê bighînin agirê Neurozê, amade ne û em bangî hemû jinên welatparêz û pêşverû dikin ku divê ew di vê erka bi şeref de, mil bidin milên me"

# Rêxistina Yekbûnê li Ewrûpayê; "Piştgiyariya Tirkiyeyê nekin"

**Sekreterê Rêxistina YEK-BÛNê ya li Ewrûpayê Salar Gelawêj bi munasebeta hatina Karayalçin ji partiyên siyasî, seroka Parlamentoya Swêdê, Komîsyona Kar û Barên Derve ya Parlamentoya Swêdê û Wezîra Karûbarên Derve ya Swêdê re nameyek şand.**

Swêd- Di 15.02.1995'an de, Wezîrê Dervê yê Tirkiyeyê, Murat Karayalçin, ji bo daxwazkirina piştgiyariya ku Tirkiye bikaribe têkeve ber Peymana Yekîtiya Gumrikê ya Ewrûpayê, hat Swêdê. Di wexta serdana xwe de, Wezîra Derve ya Swêdê û berpirsiyarên partiyên siyasî yên ku di parlamentoyê de temsîl dibin, dît.

Bi vê sedemê, di 14.02.1995'an de, Sekreterê Rêxistina me ya Ewrûpayê Salar Gelawêj, di vê derheqê de ji Wezîra Derve ya Swêdê

Lena Hjälml Wallen re, ji Seroka Parlamentoya Swêdê Birgitta Dahl re, seroka Komîsyona Karên Derve ya Parlamentoya Swêdê Maj-Lis Loow re, ji serokê grûpa parlementerên Partiya Sosyaldemokratîk Sven Hulterstrom, ji serokê grûpa parlementerên Partiya Muhafezekar Lars Tabisson, ji serokê grûpa parlementerên Partiya Merkezê Per-Ola Eriksson, ji serokê grûpa parlementerên Partiya Gel (Liberal) Lars Lejonberg, ji serokê grûpa parlementerên Partiya Çep Bjorn Samuelson, ji seroka grûpa parlementerên Partiya Jîngehê (Hawîrdor, Kesk) Marian Samuelsson, ji serokê grûpa parlementerên Partiya Demokrat a Hirîstîyan Goran Hagglund re nameyek şand û daxwaz kir ku divê ew piştgiyariya Tirkiyeyê nekin.

Sekreterê Rêxistina me ya Ewrûpayê di nameye de behsa siyaseta Tirkiyeyê dike û weha dom dike:

"...Siyaseta Tirkiyeyê ya fermî, redkirina hebûna Kurdistan û hemû mafên Kurdistan ên neteweyî û miro-

vane ye. Tirkiye bi vê siyasetê, hemû xwestinên me yên aşitîxwaz ên ji bo çareserkirineke demokratîk û siyasî, bi terora dewletê, bi top û tivingan, bi îşkenceyê û bi kuştinê ve, bi paş de vedigerine.

Em bawer in, ji bo ku êrişên Tirkiyeyê yên li hember Kurdistan bêne rawestandî û Tirkiye heqên Kurdistan ên mirovane nede nav lîngan, wela-tên Ewrûpayê, dikarin roleke baş bilayezin. Ji ber ku ew di vî warî de, xwediyên gelek mecalan in. Ev bûyera rojane; Peymana Yekîtiya Gumrikê ya Ewrûpayê, fersendeke baş e ku hûn ji Tirkiyeyê bixwazim ku ew êrişên xwe yên li hember Kurdistan rawestîne û guh bide daxwazên Kurdistan. Em bawer in ku hûn bi helwesteke wilo dikarin tesirê li Tirkiyeyê bikin. Ji ber ku di van mehên dawiyê de, Tirkiyeyê da xuyakirin ku li hember rexneyên ku ji YE (Yekîtiya Ewrûpayê) û ji rêxistinên din yên mirovane û demokratîk tên, nema dikare zêde di ber xwe de bide."

□

## Yekîti û Hevkarî

Kurd di nav şetekî giran de ne. Ji bo ku bikaribin bi ser bikevin, hewcedariya wan bi yekîti û hevkarîyan heye. Yekîti û hevkarî îro pêwistiyên ferz in. Lê digel vê ji heta nuha em bi ser neketine ku destkevtiyê weha ava bikin. Avakirina dezgeheke weha ne hêsan e. Di telosîna azadiya neteweyî ya Kurdistan de, serkevtina yekîti û hevkarîyan, awayê mobilîzekirina hêza Kurdistan a îdeal e. Divê gelek fedekarî di vê derheqê de bê kirin. Loma ji heger ku nebe, divê hêvî hilneweste, divê xebat berde-wam be. Divê xebata di vê derheqê de bistewe, divê wexta avakirinê bê. Ji hewildanên ku heta roja îro di vê derheqê de hûne, xuya dibê ku xebata Kurdistan a di vê derheqê de hîna nestewiya ye.

Mixabin hesabên grupî yên pragmatîst, berî berjewendiyên neteweyî tên. Di hewildanên avakirina hevkarîyan de, ew mantiqê ku dibêje; "bila hemû tişt ji bo Kurdistanê be", ne serdest e, lê mantiqê ku dibêje; "bila hemû tişt

ji bo serketinên min bin" derdikeve pêş. Loma rastiya Kurdistan li bakurê welêt, îro ji bo vê xwestin û pêwistîya îdeal ne amade ye. Di hevkarîya ku em ê ava bikin de, "Ez ê bibêjim û biryaran bigirim, lê divê hemû kes piştgiyariyê lê bikin! Siyaseta ji ez ê bafîrînim û bimaşînim, heger îro weha û sibehê wekî din ji be, ez dizanim, hûn bi-din di min" tê gotin. Lê mixabin ku tu hevkarî bi helwest û dîtineke weha ava nabe. Divê ev mantiq ji nav hewildanên Kurdistan ên ji bo hevkarî û yekîtiyan derkeve.

Lê mixabin ku ev mantiq hîna jî, bi qasî ku hemû hewildanên di vê derheqê de bûn û lê rawestî, li ba PKK'ê xurt e. Ev rastiyeke di jiyana Kurdistan a siyasî de ye, mirov nikare nebîne. Tiştê ku ew mantiq ji hevkarîyê fîm dike, ku divê piştgiyariya li kirin û siyaseta wan bê kirin e, ne afirandin û birêvebirina siyaseteke nû ye, ne li darxistina xebateke hevbeş e. Tiştê ku tê xwestin, ew bi xwe çî dixwazim

divê ew bê kirin e. Ên din çî dibêjin, ew ne hêjayî guhdarîkirinê ye.

Lê weha nabe, jîyan mecalan nade serkevtina helwesteke weha. HEP û DEP ji ber helwestên weha gelek zerar dîtî û ji ber vê nikaribûn bi rola xwe ya esasi rabin. Ev xeterî li pêşiya HADEP'ê jî xuya dike. Xwestina avakirina eniyêke neteweyî jî, ji ber vî mantiqî ava nebû. Em hêvî dikin ku êdî hêviyên gelê me dê bi vê sedemê tek neçin.

Rewş ev e, lê disa ji dema xwestina hevkarîyan tê eşkerêkirin, mirov dixwaze şanseke din bidê. Dema xebata ji bo avakirina eniyê dest pê kir, li gor ku mirov bi şik hû jî, mirov hêvî dikir ku ew şikên hebûn, rast dernekevin. Mirov piştgiyariya xwestina eşkere wek vatîniyêke dîrokî didît. Lê mixabin PKK'ê hera roja hewildanên dawiyê ji piştgiyariya pêwistiyên prosesê nekir, wek taktîk li meselêyê nêrî û tiştê ku diyar e, gelêk dijwar e ku ew piştgiyariya tiştêkî weha bike. Lê wext diçe, şert li Kurdistan dijwartir dibê û xetera li pêşiya gelê Kurd nezîktir dibê.

## Rêxistina YEKBÛN'ê ya Ewrûpayê ji Konseya Wezîran a Yekîtiya Ewrûpayê re name şand:

# "Deriyê Ewrûpayê li Tirkîyeya dest bi xwîn venekin"

Belçîka- Wek tê zanîn di 6'ê Adarê de Konseya Yekîtiya Ewrûpayê bi Tirkîyê re li ser pîrsa yekîtiya gumrukê civiya û daxwaza Tirkîyeyê ya di warê yekîtiya gumrukê de qebûl kir.

Beriya vê biryarê, Sekreterê Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê Salar Gelawêj ji Konseya Wezîran a Yekîtiya Ewrûpayê re nameyek rê kir. Di nameyê de li ser rewşa Tirkîyeyê û Kurdistanê hin agahdarî hene û ji Yekîtiya Ewrûpayê tê xwestin ku Tirkîyeyê tevî bi destên wê ye bi xwîn nêzî xwe nekin.

Di nameyê de bi kurtayî tê gotin ku Tirkîye ji bona Ewrûpayê îqna bike, di nav xebateke pîrralî de ye. Tirkîye berê bi "xeteriya Yekîtiya Sovyetê" rûyê xwe ye qirêj vedîşart û îro jî bi "xeteriya fanatîzma Îslamî" dixwaze rûyê xwe ye reş ji Ewrûpiyan veşêre. Ev 73 sal in ku Tirkîye politikaya xwe ya di derheqa înkarkirina Kurdan de ne guhertiye. Name, bi îstatîstîkên dewletê, balê dikşîne ser wahşet û teora dewletê ya li ser gelê Kurd. Name weha dom dike:

"Dewleta Tirkîyeyê ji ber daxwazên navneteweyî û bi taybetî daxwaza we, carinan pîrsa 'demokratîk-bûyîna qanûnan' tîne rojevê. Lê di vî warî de tu gaveke berbiçav nehatiye avêtin. heger ji bo xapandina tiştên biçûk kiribin jî, yek ji wan jî ne ji bona sivikkirina tadeya li ser Kurdan e. Bi taybetî beriya civîna 6'ê Adarê, hevdûdîtînen wezîrê derve" yê Tirkîyê Murat Karayalçîn ku bi we re yeko-yeko çêkir, qala hin guhertînen Qanûna Esasî kir ku nuha di rojêva Komîsyona Qanûna Esasî ya Meclîsa Tirkîyê de ye. Lê yek ji van pêşniyarên ku ji bo guhertîna Qanûna Esasî hatine amadekirin jî direkt an îndîrekt pîrsa Kurdî çareser nake, heta bi kêmasî be jî pîrsê sivik nake. Ji xwe ev 17 sal in ku bi îdarekirina awarte li Tirkîyeyê û li Kurdistanê du şeklên cûda yên huquq, îdare û dadgehîyê (yargî) hatine holê".

S. Gelawêj di nameyê de careke din tîne bîra Konseyê ku Tirkîye tu carî li peymanên navnetewî yên ku wan bi xwe îmzekirine lê xwedî derneketiye û ew her dane ber lîngan.

Lewra ger Tirkîye peyman qebûl bikira, diviyabû di qanûnên xwe de jî li gor wan, guhertin bikira. Lê di qanûnên Tirkîyeyê de gellek tiştên li dijî heqê mirovan hene. Name ji wan qanûnan gellek mîsalan pêşkêş dike û weha diqede:

"Wek me li jorê jî bi xetên giştî qal kir û hun jî ji nêzik ve dizanin, tu têkiliya rastiya dewleta Tirkîyeyê ya siyasî û huqûqî ya li hember gelê Kurd û mafên mirovî, bi qîmet û esasên ku Yekîtiya Ewrûpayê aniyê holê tune. Bi ya me divê li hember dewleta ku xwediyê xwe û van kiryanan be, helwest ew be ku ambargoyeke eskerî, aborî û siyasî bête danîn, ne ku deriyê Ewrûpayê jê re bê vekirin. Ev baweriya me di eynî wextê de, wek ku biryara Parlamentoya Ewrûpayê ya dawîn jî dide diyarkir-

in ku ji aliyê beşeke mezin a gelê we jî tê parastin.

Em wek Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê, di vê baweriyê de ne ku heta dewleta Tirkîyeyê hemû peymanên navneteweyî yên di derheqa mafên mirovan de qebûl neke û di pratîkê de gav navêje, îmzekirina Peymana Yekîtiya Gumrukê, wê li dijî qîmetên siyasî yên esasî avakirina Yekîtiya Ewrûpayê be. Ji ber vê yekê em bawer in ku hun ê ancax Tirkîyeyê ku hurmeta wê ji mafên mirovî re heye û mafên esasî yên mirovî û neteweyî yên gelê Kurd nas dike, layiqî îmzekirina Peymana Yekîtiya Gumrukê bibînin.

Em bi vê bawerî û hêviyê, silavên xwe ji we re rê dikin û di karên we de serkevtinê dixwazin".

## "Tirkîye hîn bi metod, rê û awayên hov û barbar îdare dibe"

Swêd- Rêxistina YEKBÛN'ê ya Swêdê jî bo raya giştî ya Swêdê, li ser rewşa Kurdistanê bi zîmanê Swêdî belavokek derxist û ji hemû dezgehên re bi postê û ji bo raya giştî jî li kolanan belav kir. Di destpêka belavokê de bi kurtî li ser rewşa Kurdan tê rawestîn:

"Tirkîye di vê pêvajoya ku ber bi sala 2000'î ve diçe de, hîn bi metod, rê û awayên hov û barbar îdare dibe û her dixwaze bi wê riyê Kurdistanê di destê xwe de bihêle. Hîn 15 milyon Kurd li ser erdên xwe, mafê bi kar anîna zîman jî tê de ji hemû mafên xwe yên neteweyî û insani hê par in. Di gel ku Dewleta Tirkîyeyê hemû peymanên navneteweyî yên ku mafên mirovî û demokratîk diparêz in, imzê kiriye jî ev rewş her berdewam e..."

Di belavokê de tiştên ku hukûmeta Tirk dike, yek bi yek tên rêzkirin û ji bo piştgiriya gelê Kurd, ji hemû kes û dezgehên Swêdî daxwaz tê kirin.

Her weha du rojnameyên Swêdî "Arbeter" û "Norska Flamman" jî di nava rûpelên xwe de belavoka Partiya me weşandin.

## YEKBÛN'ê Maria Leissner pîroz kir

Swêd- Dosta Kurda Maria Leissner bû seroka Partiya Gel a Lîberalan. Bi munasebeta hîlbijartinê Sekreterê Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê Salar Gelawêj ji M. Leissnerê re nameyêke pîrozbahiyê şand.

Nameya li ser navê YEKBÛN'ê ya bi hêviya serkevtina di karê wê yê nuh de dest pê dike, weha didome; "Em hêvîdar in tu dê di pêşerojê de jî hem wek şexs û hem jî wek seroka partiyê bi giştî di politikaya derve de û bi taybetî jî di pîrsa Kurd de rola xwe ya erîni her bidomîne.

Maria Leissner dosteke Kurdan e û di avakirina Komîteya Swêdê ya ji bo Mafên Mirovî yên Kurdan de û her wisa di birêvebirina vê Komîteyê de wek nûnera Partiya xwe du salan kar kir.

# Rêxistina YEKBÛN'ê ya Ewrûpayê Kongreya xwe ya Duyemîn çêkir

Di 23-24-25'ê Çileyê pêşîn a 1994'an de, Kongreya Rêxistina YEKBÛNê ya Ewrûpayê, li Stockholmê civiya. Nûnerên ji heft welatên Ewrûpayê beşdarî Kongreyê bûn. Hinek nûnerên welatan ji ber sedemên teknîkî nikaribûn beşdarî Kongreyê bibin. Lê dîsa, ji %87'ê nûnerên ku li ser navê rêxistinê hatibûn hilbijartin, beşdarî kongreyê bûn.

Kongreyê bi rawestina ji bo giramiya şehidan ve dest pê kir. Piştî axavtina li ser navê Rêxistinê, mewanên kongreyê axivîn. **Abdurahmanê Gundikî** li ser navê Komîteya Navendî axivî. Birêz Abdurrahman di axavtina xwe de got: "Ez li ser navê Komîteya Navendî Kongreya we pîroz dikim. Ez hevîdar im ku wê Kongreya we gellek pîrsgirêkan çareser bike û Partiyê di karê çareserkirina doza Kurdistanê de xurttir bike." Birêz Abdurrahman di dawîya axavtina xwe de, bal kişand ser rewşa Kurdistanê û got: "Çareserkirina pîrsa Kurdî barê me ye û hinek ji vî barê giran dikeve ser milên hevalên li Ewrûpayê. Divê hevalên li Ewrûpayê bikaribin rêya doza Kurdistanê li qada navneteweyî hinekî din vekin, da ku Kurd bikaribin di vî qadê de, bi awayekî rêxistinî temsîl bibin."

Taybetiyeke din ev bû ku nûnerên rêxistinê RNK, TSK û TS jî wek mewan beşdarî Kongreyê bûn. Wek tê zanîn Partiya me YEKBÛN, RNK, TSK, Tekoşina Sosyalîst û KAWA, biryara avakirina yekîtiyê dane. Rêxistina YEKBÛNê ya li Ewrûpayê, ji ber vî munasebetê, gazî wan rêxistinên jî kir û xwest ku ew bîn bibin mewanên Kongreyê. Ji ber sedemên teknîkî, nûnerê KAWA beşdarî Kongreyê nebû. Lê nûnerên hersê rêxistinên din beşdarî Kongreyê bûn û axavtineke hevbeş pêşkêş kirin. Hersê hezan di axavtina xwe ya hevbeş de, rewşa Kurdistanê û girîngiya yekîtiya sosyalîstan û hevîyên xwe yê di vî warê de anîn zimên û axavtina xwe bi van gotinan qedandin; "Yekbûn di pêvajoyeke weha aloz de, Kongreya xwe ya derveyî welêt çêdike. Em ji dil û can kongreyê serkevtî û YEKBÛNêke bi hêztir daxwaz dikim."

Piştî axavtina mewanên din, di ransera roja pêşî de, raporên kar hatin xwendin. Rapora xebatê û rapora malî hatin xwendin. Nûnerên Komîteyên hemû welatan jî raporên xwe xwendin. Piştî xwendina raporê, raberizînên li ser raporê çêbûn. Herkesî di bin misogeriya demokrasîya fireh a Partiyê de, lênerîna xwe

bi awayekî azad anî ser zimên. Dû re bersivên rexneyan hatin dayin. Piştî wê, Komîteya kevî ji berpirsiyariya kar û xebata dema buhurî, bi yekdengî ve hat azad kirin.

Kongre, roja duduyan li ser çareserkirina kêmasiyan, xurtkirina xebatê û perspektîvên siyasî yê Partiyê rawestiya. Ji bo çareserkirina

pîrsgirêkan gellek pêşniyar hatin pêşkêşkirin. Gellek ji van pêşniyaran, bûn biryarên Kongreyê.

Roja sêyem jî Komîteya nû ya Rêxistina Ewrûpayê hat hilbijartin. Roja duyem, Sekreterê me yê giştî birêz E. Serdar Dîlan jî mesajek gihand Kongreya me.

## Beşek ji mesaja Sekreterê Giştî yê YEKBÛN'ê E. Serdar Dîlan

Hevalên heja,

Têgihîştina sedem û naveroka pîrsgirêkan, di rêya çareserkirinê de nêviyê serkevtinê ye. Ji ber vî yekê jî, têgihîştina pîrsgirêkan ku welat, gel û Partiya me rû be rû dibin, gellek girîng in. Partiya me, bi zanebûna vî vatîni û berpirsiyariya dîrokî, ku têkoşîna neteweyî û civakî daniye ser milên me, di Cotmeha 1994'an de Kongreya xwe ya Duyemîn bi serfirazî pêk anibû. Piştî vî gavê, pêkhatîna Kongreya Rêxistina Ewrûpayê jî, nişana berdewamî û biryardariya Partiya me ye; nişana demokrasîya nava YEKBÛN'ê ye. Ez bi vî bextewarî û dilşadîyê, ez silavan li hemû nûnerên Kongreya we dikim.

Wek hun jî dizanin, YEKBÛN bi pêvajoyeke gelek zehmet û di rewşeke pîrs girîng de hatibû damezrandin. Hêzên ku YEKBÛN ava kirin, bi her awayî xwîn wenda kiribûn. Şertên dinyayê, yê herêmê, yê welêt û Tirkiyeyê jî binî ve hatibûn guhertin. Hêzên siyasî perçe perçe bûbûn... Yanî karê me ne hêsan bû. Lê belê, li gel van hemû tiştan jî, me hevîya xwe, bîr û baweriya xwe wenda nekir. Me bi mêjiyekî nû, bi ruh û kultureke nû gaveke dîrokî avêt; me YEKBÛN ava kir. Û ev gav îro, bi lihevkerina Kawa, RNK, TS, TSK û YEKBÛN'ê ve hîna pêşdetir diçe. Wê di têkoşîna serxwebûn, demokrasî û sosyalîzmê de rûpelekî nû vebe.

Hevalno;

Problemên me pîrs in; di warê aborî de, kadiran de, diplomatîk de,

eskerî û çapemenî de gellek problemên me hene. Lê belê, em mecbûr in ku vana çareser bikin. Me barê gelê xwe, barê welatê daye ser milên xwe. Gelê me bi hevîyê gelleke mezin li me dinihêre. Potansiyela me gellek fireh e. Lê hezar mixabin, pîrên ku di navbera me û vî potansiyelê hene, ne ewqas xurt in. Divê, em vî rastîya xwe bibînin û li gor wê, li rîyê çareserkirinê bigerin.

Di pêvajoya ku em tê de dijîn de, ne problemên Partiya me bi tenê, lê bi tevayî problemên tevgera neteweyî û demokratîk hene. Îro ev problem girantir bûne; gelê me di tengasiyê mezin de ye. Tengasiya gelê me, tengasiya me ye jî. Herçend di dîroka Kurdistanê de, meseleya Kurdistan tu carî weke îro nebûye meseleyeke navneteweyî jî, çî mixabin, Kurdistan hîna jî li Kurdistanê Bakur serokatiyê neteweyî ava peyde nekirine. Weke hemû hêzên siyasî, ev vatîniya neteweyî li ser milên me ye jî. Lê, divê em baş bizanibin ku heta li Kurdistanê, em di nava gelê xwe de xurt nebin, wê otorîteya neteweyî jî cepheya Kurdistanê jî wê pêk neyê. Ji ber vî yekê jî, ji bo berjewendiyên gelê Kurd, ji bo têkoşîna neteweyî û civakî, divê em xwe bijînin, dev ji sistayîyê berdin. Divê çî li welêt, çî li Ewrûpayê û çî li deverên din, wekî berpirsiyar û endamên YEKBÛN'ê haya me ji girîngiya xebata me hebe.

Xebat û hewildanên hevalên li Ewrûpayê li ber çavan e. Ji avakirina YEKBÛN'ê û heta îro, bi rastî jî pêşveçûnek ber bi çav heye. Lê belê, dîsa jî li gor potansiyela xwe, gellekî

li paş e. Hun dikarin di warê aborî û kadiran de, çapemenî û diplomatîyê de, gellek tiştan bikin. Hun dikarin ji bo pêşketina di vî warê de, gellek îmkân amade bikin. Divê hevalên li Ewrûpayê xwe hîna baştir bijînin û di çareserkirina problem û astengiyên partiyê de roleke esasî bileyizin.

.....

Hevalên heja:

Şertên welêt gelek dijwar bûye. Kêmasî, astengî û problemên Partiya me yê giştî pîrs in; yê li Ewrûpayê pîrs in. Ji vana girîngtir jî, problemên gel û welatê me pîrs in. Lê belê, vana ne bê çare ne. Dema ku em hemû, bi can û dil, bi hemû potansiyela xwe, wekî xwediyê kar, xwe bibînin, wê gavê ji bo ku em bi ser nekevin, tu sedem namîne. Ji ber vî yekê, ez bawer im ku Kongreya we jî, weke Kongreya me ya Duyemîn, wê ji bo Partiya me û gelê me biryarên baş û di cîh de werbigre; wê mîsyona xwe ya di warê rê vekirinê de, bine cîh. Û bi rêberîya biryar, politîka û perspektîvên Kongreya Duyemîn, wê ev Kongreya jî, di jiyana demokratîk a nava Partiyê de, bibe xeletke nû. Wê yekîti û demokrasîya Partiyê xurtir bike.

Ez silavên xwe pêşkêşî hemû nûnerên Kongreyê dikim. Û ji bo pêk anîna Kongreyê jî, we ji dil pîroz dikim. Li ser navê Komîteya Navendî, serkevtina we dixwazim. Xurtbûna we, serkeftina me nêziktir dike.

## Hin notên Kongreya Duyem

Kongreya Duyem a Partiya Yekbûnê ya Gel a Kurdistanê (YEKBÛN) di dawîya Îbona 1994'an de li Kurdistanê çêbû. Kongre di şertên dijwar de bi beşdarîyê mezin civiya. Ji % 30'ê nûnerên ku hatibûn hilbijartin, ji ber sedemên teknîkî û ewlî nikaribûn beşdarî Kongreyê bibûn. Hejmara jînan nûner kêm bû. Vê jî di warê endamên jin de, rastîya Partiyê dida xuyakirin. Ji xwe bi tenê ji % 4,9'ê endamên Partiyê jin in.

Kongreya Duyem di bin ronahiya tecrûbeyên xebata rêxistinî û di atmosferêke demokratîk de 8 rojan ajot. Di van 8 rojan de gelek tişt hatin munaqeshe kirin. Ji % 30'ê nûneran beşdarî munaqeseyên li ser rapora siyasî ya ku ji aliyê Komîteya Navendî pêşkêşî Kongreyê bûbûn û bi vî awayî mafê xwe yê di warê avakirina politîkaya Partiyê de bi kar anîn. Di beşa munaqeseyan de, tehamûliya ku li hember lênerîna jî hevdû cuda dihat kirin û enerjîya ji bo li gor huqûqa Partiyê hevdû îgnakirinê dihat serîkirin, hejaya pesinandinê bû.

Ji listeya ku di Kongreyê de hat pêşkêşkirin, diyar dibû ku YEKBÛN di nav civata Kurd de bi rêxistin e. Ji her kategoriya civatê însan di bin şemsiyeyê xwe de civandiyê. Memûr û mamoste pro-senta herî mezin a Partiyê pêk tîne. Yê ku mirov di şertên Kurdistanê de jî wan re dikare bibêje ronakbîr, ji % 72 endamên Partiyê teşkil dikirin.

Rewşa xwendina endamên

YEKBÛNê  
% 36 Unîwersîte  
% 36 Lîse  
% 13 Orta  
% 12 Seretayî  
% 2 nexwende

Rewşa cinsiyeta endamên

YEKBÛNê  
% 94 mêr  
% 6 jin

Rewşa emrê endamên YEKBÛNê

% 70 di navbera 31-40  
% 20 di navbera 18-30  
% 10 di navbera 41-55

Herçiqas wek rêxistin emrê YEKBÛNê ne gelek dirêj bû jî, lê mîrasa ku ew ji hatîye digihîje destpêka xebata rêxistinî ya Kurdistanê Bakur. Tereftên ku YEKBÛN ava

kiribûn di 30 salên dawiyê de wek rêxistin di gelek waran de derbas bibûn; xurt bibûn, perçe bibûn, zaf ketibûn lê dîsa jî di ber xwe dabûn. Serokên manewî yê tereftên ku YEKBÛN ava kiribûn Sait Kirmizitoprak (Dr. Şivan) û Sait Elçi bû û ew di dîroka de bûbûn sedemên şehîdbûna hevdû. Ji bo vî meselê, bi sahan di nava nakokiyên mezin de jiyabûn. Lê di dawiyê de aqil bi ser ket û hezan bi hevdû re YEKBÛN ava kirin. Bi vî awayî di jiyana siyasî û rêxistinî ya Kurdistanê de tradîsyoneke nû hat jiyandin. YEKBÛNê tîstê ku di dîroka Kurdistanê de îstîsna bû, pêk anî û herdu serokên ku bûbûn sedema kuştinê hevdû jî kir şehîdên xwe.

Şehîdên YEKBÛN'ê

Faîk Bucak, Sait Elçi, Sait Kirmizitoprak (Dr. Şivan), Hikmet Buluttekin (Çekol), Hasan Yekilmiş (Brusk), Necmettin Büyükkaya, Vedat Aydın, Mehmet Sözer, Eyyüb Kemal Adıgöz, Hakkı Uzar, M. Nuri Madak, Mehmet Geren, Hamit Akil, Münir Amk, Yusuf Bayram, A. Vehab Bayram, Reşad Önen, M. Y. Yıldırım, Mehmet Oruç, Hafız Akdemir, Seydo Aydoğan, Seydoş Ayabe, A. Kadur Şenses, Yasın Şenses, Şefik Özdemir, Şevket Özlühan, Zabit Kaplan, Eşref Dursun, Abdullah Bilen, Emin Bilen, Halil Aydın, İbrahim Uluç, Halit Husni, Cemal Yibar, Bişenk Amk, Medeni Budak, M. İhsan Budak, Metin Özdemir, M. Şirin Tekin, Muhterem Biçimli, Mustafa Tanguner, Ahmet Karlı, İbrahim Ergün, İbrahim Süren, Hayrettin Yıldız, Mehmet İhan, Abdurrahman Atabay, Fuat demirbaş, Ramazan Denli, Abdurrahman Söğüt, Ahmet Söken, Faik Ayaz, Feyiz Köndü, Nedim.....

Slogana bingehîn ya Kongreyê pîrsa herî girîng a rêxistinî dîantî zimên: "Ji bo rêxistineke tîkoşer pêş ve".

Kongreya duyem tesbîteke baş kirîye. Icar dor dorê endam û kadîrên YEKBÛNê ye. Partî jî endaman pêk tî ji bo vî jî her endam divê di herêma xwe de xwediyê însiyatîvê be. Ji bo vî jî beriya herî giştî kar û xebatê pêwîst e. Divê her endam wek ku ew bi serê xwe Partî be, hereket bike.

Ji YEKBÛNê bo ciwanan

# Pêwîstî, siyaset û rastî

**M**irovan her dem xwestiye ku jiyana xweştir be, hêsantir be û ji hêla materiyal ve jî dewlemendtir be. Ev têkoşîna mirovan, ji heya yaman e li dar e. Xwestina xweştirkirina jiyane, hêl û merceke jiyane ye. Xweşiyên jiyane û azadiyên mirovan, bêyî hevdu nabin. Loma jî dema mirov bi armanca xweştirkirina jiyane radibin ser xwe, xwestinên di derheqê azadiyê de jî pê re paralêl dimeşînin. Lewra jiyana tevayiyek e.

Dilîtiya neteweyî, yek ji wan nexweşiyên ku mirov nikarin qebûl bikin e. Daxwaza çareserkirina vê yekê, dikeve pêşya bidestxistina hemû xweşiyên din. Çareserkirina di vê derheqê de, rê li ber serketinên din jî vedike. Heger li cihekî pirsgirêkeke wilo hebe, heta ku neyê çareserkirin, ne xweşî û ne jî aşîti ava dibe.

Ev şerê mirovan ê ji bo xweştirkirina jiyane, bi gelek awayan dom kiriye û hatiye heta roja me. Mirovan, di encama vî şerê dûdirêj de, gelek tişt çareser kirine û rê li avakirina xweşiyê vekirine. Lê şerê ji bo avakirina xweşiyê, hîna jî berdewam e.

**M**irov bi vê armancê kar, xwendin, siyaset û şer dikin. Jiyan, kar, xwendin û siyaset, bê şer dikare bibe. Şer ne hêl û merceki jiyane ye tabii ye. Lê şer, bê kar, bê xwendin û bê siyaset nabe. Heger mirov zorê li rewşê bike û bixwaze şer, bêyî siyaseteke rast û bi îsabet, bêyî kar û xwendineke berdewam bimeşîne jî, dê nikaribe emirdirêj be û bi serbikeve. Divê şer jiyana sivil hilneveşîne.

Şer, di jiyana mirovan de ne armanc e, ne hebûneke tabii ye. Lê şer, carinan dikare ji bo serketina siyasetê bibe pêwîstiyek, dikare rê li ber siyasetê veke. Ev pêwîstî, hew ji bo demekê ye û wasite ye. Lê heger mirov nikaribe vê wasi-

teyê rast bi kar bîne, dikare li mirov bi xwe vegere û mirov hilweşîne.

Pirsgirêkên ku mirovan ji bo peydekirina babetekî çareserkirinê radikin ser piyan û wan dixin nav xebateke siyasî an jî şerekî çekdarî, dikarin dîrokî, civatî û cografî bin. Doz dikarin bi heq bin jî û neheq bin jî. Lê li vir mebest û mijar pêwîstiya doza biheq e, rabûna bi heq e.

**S**iyaset, ji pêwîstiya çareserkirina pirsgirêkên jiyane û birêvebirina wê tê. Pêwîstî ne ji ber xwestina dilan derdikevin û bi xwestina dilan jî nabin. Ew ji jiyane dertên û li gora prensîpên xwe yê civatî dimeşin. Pirsgirêk bi hesanî çareser jî nabin. Ji ber ku, li devera ku pirsgirêk lê hebin, hêla negatîf bi hêz e, bi hesanî jî rê demakeve.

Pêwîstiya çareserkirinê, ji dîtina pirsgirêkan û xwestina baştirkirina jiyane tê. Ew babet pêwîstî, divê jiyane baştir bikin. Tiştê ku jiyane baştir dike, şerê parastina tiştên ku hene û bidestxistina mecala avakirina tiştên nû ye. Lê şikandina kursiyekê bi xwe jî, jiyane bi qasî buhayê wê kursiyê xizantir dike. Dema mirov bixwaze kursiyekê ji bo baştirkirina jiyane bişikîne, divê mirov bikaribe duduyan çêke û ji nû ve yekê bişikîne. Yanî di şerekî wilo de, carinan, tiştin ji bo tiştinan dibin qurban. Lê mirov nikare tiştên giranbuha bike qurbana tiştên biçûk. Mirov nikare deh mêran ji bo girtina du tivingan bide kuştin. Divê heger ku pêwîst be, tiştên biçûk û hindik bibin qurbana tiştên giranbuha.

Pêwîstî, dîtina pirsgirêkên jiyane û xwestina çareserkirinê bi serê xwe bi tenê, têra biserketinê nakin. Ji bo biserketinê, siyaset û helwesteke rast divê. Ji bo ku mirov bikaribin siyaseteke rast bimeşînin û helwesteke rast werbigirin, divê mirov bikaribin rastiya xwe ya dîrokî, civatî û cografî

bibînin. Divê bikaribin rewşa ku tê de ne, rast şirove bikin.

Heger mirov van tiştan ji bo pêwîstiyên serketina şerê azadiya neteweyî ya Kurdan formule bike, divê Kurd bizanibin bê dikarin kengî çî bikin û kengî nikarin çî bikin. Divê siyasetvanên Kurdan li ser vê yekê baş konsantre bibin.

Kurd siyasetê dikin. Dixwazin azad bibin. Civaka xwe bi xwe bi rê ve bibin. Jiyanekê ji hêla aborî ve, bi rûmettir û ji hêla civatî ve jî bê stemkarî dixwazin. Bêguman ev xwestinên bi heq in û bi rûmet in. Lê dijmin heta nuha nehiştiye û wê ji nuha û pê ve jî nehêle. Dijmin xurt e, anihî jî Kurdan xurtir e. Ev astengeke mezin e. Madem wilo ye, ji bo ku Kurd bikaribin di vê tekoşinê de bi ser bi kevin, divê hemû hêza xwe, di hemû qadên tekoşinê de, ji bo gîhaştina armancên xwe mobilîze bikin, qet nebe paralêl mobilîze bikin û ji bo serketinên rojane jî, bikaribin hevkarîyan bikin. Xwestin û pêwîstiya Kurdan ya îdeal, ev e. Şertên biserkevtinê jî ev in.

**L**ê carinan jiyana, dema mirov jê dixwaze mecalê nade serketina xwestin û pêwîstiyên. Ji ber ku rewşê nade, ji ber ku ne amade ye. Ji ber rastiyeke ku mirov hîna pê nikare di holê de heye. Rastî, qewînbûna hêla rewşê ya negatîf e. Rastî tal jî be û şerî jî be, pozîtîf jî be û negatîf jî be, lê dîsa rastiyeke heyî ye. Tiştê ku rewş dikare pêşkêş bike, ew tiştê ku mirov dikare wê bîstikê bijî û jê bigire ye. Ew bîstik bi xwe rewş e. Mirov nikare berekî zêdeyî ku rewş dikare, pêşkêş bike, jê bigire. Lê heger ku mirov, tiştên ku rewş nikare bide, jê bixwaze û zorê lê bike, wê çaxê têkoşinê dibe macera û xeyalperestî. Kirinên di vê derheqê de dibin sedema destpêka ketina mirov. Mixabin tiştê ku îro li bakurê Kurdistanê dibe, ev e.

# Li Diyarbekirê MED-KOM

Kurdistan- Di 25'ê Sibate de li Diyarbekirê MED-KOM (Navenda Organîzasyona Çand û Hunerê ya Medyayê) hebû. 700 (heftsed) kes beşdarî civîna vekirina MED-KOM'ê bûn. Di nava beşdaran da Serokê Baroya Diyarbekirê Awûqat Huseyîn Tayfun, Sekreterê Baroyê Awûqat Sezgîn Tanrikulu, Berpirsiyarê Buroya Partiya Demokrat a Kurdistanê-Yekgirtin a li Diyarbekirê Ahmet Zebârî, serokê rêxistina HADEP'ê ya li Diyarbekirê Fîrat Anil, serokê Herêma 8'an a DÎSK-Genel-Îş'ê (Sendikaya Karkerên Belediyeyan) Haci Yîgît, serokê kevn ê Rêxistina Tebîban Mahmut Ortakkaya, nûnerê TMMOB'ê (Rêxistina Muhendis û Mîmaran) liqê Diyarbekirê, serokê DÎSK-Genel-Îş'ê liqê Diyarbekirê, nûnerê Eġtîmsen (Rêxistina Ma-

moste û Perwerdekarên) liqê Diyarbekirê, endamên Komîteya Karker ya HKD, berpirsiyarê rojnameya Dengê Azadî li Diyarbekirê jî hebûn. Ji nava welêt û li derveyî welêt gellek mesajên pîrozbahiyê gihîştin destên birêvebirên MED-KOM'ê. Rêxistina Ewrûpayê ya Partiya me jî ji civînê re mesa-jeke pîrozbahî û piştgiriyê şand.

Li ser navê MED-KOM'ê yek ji damezrênerê Navendê Îrfan Çilgin bi hêviya ku ev navend "di warê amadekirina şertê paraztin û pêşdebirina çanda Kurd de, bibe gawek" dest bi peyva xwe kir. Î. Çilgin di axavtina xwe de got: "Divê em bi awayekî bi rêxistî û bi perspektîveke neteweyî ji bo avakirina hemû dezgehên xwe hewil bidin. Ev pêwistiyek e".

Îrfan Çilgin axavtina xwe weha qedand: "Di dirêjahiya dîrokê de dewletên kolonyalîst bi navê 'mozaîka kultural' xwestine hebûnên me dejenere bikin. Îro zimanê me, folklorê me, edebiyat, tiyatro, mûzîk û hemû hebûnên me yên din ên kulturî di bin êrîşeke dijwar de ne. Ji bo ku em bikaribin li dij van êrîşan rawestî û hêjayiyên xwe biparêzin, fedekarî, mêrxasî û lêbixwedîderketineke zanistî pêwîst e. Ji bo bicîhanîna van armancan, berpirsiyarî dikeve ser milên hemû hêz, dezgeh û rêxistinên Kurd."

Piştî axaftinê, hunermendên ku ji çar aliyên welêt hatibûn dawetkirin, bi programeke dewlemend, numûneyên muzîka Kurdî pêşkêşî beşdaran kirin.

## Êrîşên nuh li ser çapemeniya Kurd

**Tirkiye-** Êrîşên dirindane yê dewleta Tirk li ser çapemeniya Kurd berdewam e. Dewlet bi girtin û cezakirina zîndan, perayan û bi komkirina weşanan nikaribû pêşî li çapemeniya Kurd bigre. Kuştina bi dehan rojnamevanan, ambargoya şirketên belavkirinê, girtin, îşkence û tehdîtkirina belavkir û xwendevanan jî nikaribû rojname, kovar û pirtûkên Kurdî rawestîne.

Di van demên dawî de dewlet bi biryarên nuh, bi kîn û nefreteke mezin êrîşeke giran dibe ser çapemeniya Kurd. Merkez û avayiyên rojnameyan bombe dike, li çapxaneyan, li postaxaneyan di kargoyan de bêyî îzna dadgiran, dest dide ser weşanan, hemû xebatkarên buroyên rojname û kovaran digre. Nuha jî kovar û rojnameyan bi temamî digre.

Ev êrîş jî qewimandina bûyeran ji xuya ye ku bi yek biryarê û bi destûra yek merkezê hatiye plankirin. Ev jî **Konseya Ewlekariya Neteweyî** ye ku li Tirkiyeyê benê hemû dezgehên dewletê xistiye destên xwe.

Êrîşên bi vî rengî di destpêka meha Çileyê Pêşîn de bi bombekirina merkez û du şubeyên **Ozğur Ulkeyê** dest pê kir. Di bombekirina merkeza **Ozğur Ulkeyê** de, avahiya

wê hilweşiya û xebatkarekî wê şehîd ket.

Di 9'ê Çileyê Paşîn de polis li Ankarayê bi hejmareke pîr zêde girt ser buroyên rojnameyên **Direnîş, Ozğur Halk, Medya Guneşî, Devrîm, Alinterî û Atilimê**. Polis li nûner û xebatkarên buroyan xist û ew xistin nezaretê. Di destpêka meha Sibate de, **Ozğur Ulkeyê** bi sedema ku berdewama **Ozğur Gundemê** ye, bi temamî hat girtin.

Di 10'ê Çileyê Pêşîn de hejmara 60'î ya "**Medya Guneşî**" yê li ser daxwaza dadgirê **Dadgeha Ewleyî ya Dewletê (DGM)** hat civandin. Beriya ku bi resmî hejmara 60'î bê civandin, 2500 libên wê ji aliyê polisyan ve di kargoya balafiran de hatibûn girtin. **DGM'a Stenbolê** di 4'ê Sibate de "**Medya Guneşî**" bi rawestandina mehekê ceza kir û 6 meh zîndan û 50 milyon lîra ceza da **Berpirsiyarê Nivîsan Nusrettîn Yuksekkaya**.

Êrîşên li ser **Medya Guneşiyê** bi vî nesekinîn. Polisyan di 28'ê Sibate de, polisyan girt ser buroya Diyarbekirê û 2 muxabîr û 4 xwendevan girtin. Li muxabîrê **Medya Guneşiyê T. Menguşer** îşkence hat kirin. Di 6'ê Adarê de, hêzên dewletê careke din girt ser buroya

Diyarbekirê, dest danîn ser gelek dokument û weşanên wê. Her di eynî rojê de yek ji xebatkarên **Medya Guneşiyê Ş. Karakurt** li merkeza bajêr ji alî polisyan ve hat girtin û polisyan îşkenceyê giran lê kir. Êrîşên li ser buroya **Medya Guneşiyê** ya Diyarbekirê dom kir. Di şeva 8'ê Adarê de kesên huwiyeta wan nediyar" dîsa girtin ser buroyê, derî û eşyayên wê şikandin, hin weşan û ewraqên buroyê jî dizîn.

Buroya **Medya Guneşiyê** ya Adanayê di nav mehekê de ji alî polisyan ve 4 caran hat "ziyartkirin".

Ji aliyê din ve li Adanayê nûnerên buroyên **Alinterî, Barîkat, Direnîş, Dengê Azadî, Jiyana Nû, Kizil Bayrak, Newroz, Odak, Ozğur Halk, Partizan Sesî, Stêrka Rizgarî û Medya Guneşiyê** civiyar û bi hevdû re **Platforma Çapemeniya Şoreşger li Adanayê** ava kirin. Platformê di beyana xwe ya pêşî de daxwaz kir ku divê xebatkarên rojname û kovarên **Devrîm, Odak, Ozğur Halk û Medya Guneşiyê** bêne berdan.

Dewlet êrîşên xwe yên li ser rojname û kovaran didomîne. Di 9'ê Adarê de **Dengê Azadî** jî bi temamî hat girtin.



# Li Almaniyayê civînên YEKBÛN'ê

Wek tê zanîn di havîna 1994-an de li welêt Kongreya YEKBÛN'ê ya Duyemîn civiya. Piştî ku nûnerên ji Rêxistina Ewrûpayê ji Kongreyê veg-eriyân, di derheqa Kongreyê de bi gelek awayan agahdarî gihandin raya giştî. Ev kar bi programeke taybetî hat meşandin.

Li gora vê programê, li gelek bajarên Almaniyayê civînên agahdariyê hatin amadekirin. Civînên li Krefeldê, Freudstadtê, Giessenê, Hamburgê, Bremenê û Stuttgartê di atmosfereke demokratîk de û bi rêk û pêk meşyan.

Di hemû civînan de, bi taybetî li ser biryarên Kongreya Duyemîn, perspektîvên Partiyê û rewşa welêt a îroyîn hat axaftin. Nûnerên YEKBÛN'ê, di wan civînan de eşkere kirin ku serkevtina Kurdan a neteweyî, bi tenê bi yekîtiya hêzên Kurd mumkun e. Ev yek, siyaseteke YEKBÛN'ê ya bingehîn e û Kongreya Duyemîn jî bi taybetî li ser çareserkirina pirsgrêkên di vî warî de hene, rawestiyaye. Nûneran gotin ku partiya me heta roja îro, di vî warî de gelek gav avêtine. Em bi RNK û TSK-ê re gihabûn biryara yekîtiyê. Ev platform piştî Kongreya Duyemîn firehtir bûye. Nuha YEKBÛN, Kawa, TSK, TS û

RNK-ê biryara yekîtiyê dane. Ji bo ku ev biryar here serî, gelek karên bingehîn qediyane û taslaxê programa yekîtiyê amade kirine. Li gor biryarê, dê her pênc hêz bi hev dû re kongreyeke hevbeş bicivînin û bibin yek.

Nûnerên YEKBÛN'ê girîngiya xebata eniya neteweyî ya demokratîk di civînan de dubare kirin. Nûneran got ku bi derengketina karê avakirina eniyê, kêmasiyeke mezin e. Ji ber ku hin hêz bi awayekî taktîkî li vê meseleyê dinêrin, karê avakirina eniyê, mixabin ber nade.

Nûnerên YEKBÛN'ê, careke din eşkere kirin ku Dewleta Federe ya Kurdistanê Başûr, ji bo Kurdên her çar perçeyan serkevtineke neteweyî ya girîng û qonaxeke mezin e. Loma parastin û xurtkirina wê jî ewqasî girîng e û ji bo hemû Kurdan berpirsiyariyeke dîrokî ye. Her çî dibe bila bibe, divê hêzên siyasî bikaribin di hemû rewşan de li hevdû bikin û bi hevdû re dezgehên dewletê ava bikin. Şerrê wan, karê dijmin hêsantir dibe û dewletê ber bi hilweşandina ve dibe. Loma jî YEKBÛN, şerê ku di nav herdu hêzên mezin ên Başûrê Kurdistanê de derketiye, wek şerê birakujiyê dinirxîne.

## Dewletê dest danî ser Programa YEKBÛN'ê

Tirkîye- Programa YEKBÛN'ê û biryar û rapora politîk a Kongreya Duyemîn a YEKBÛN'ê, ji aliyê Weşanxaneyê Çarçirayê li Tirkîyeyê wek du broşuran hatin çap kirin. DGM (Mahkema Ewlekarî ya Dewletê) a Stenbolê piştî çapkirinê bi çar seetan, biryara civandina herdu broşuran da.

Di 09.03.1995-an de, li Stenbolê programa YEKBÛN'ê bi Kurdî û Tirkî, rapora politîk û biryarên Kongreya Duyemîn ya YEKBÛN'ê wek du broşuran hatin çapkirin. Wek tê zanîn herdu broşur beriya muha bi çend mehan li Swêdê wek broşurêke hatibûn çapkirin. Weşanxaneyê Çarçirayê jî ev belge-yên Kongreya Duyemîn ên YEKBÛN'ê wek du broşuran pêşkêşî raya giştî ya Tirkîyeyê û Kurdistanê kir. Lê dewleta li ser bingehê qedexeyan hatiye avakirin, anca bi qasî çar seetan tehamulî matê raya azad kir û piştî ku pê hesiya ji mekanizma xwe ya qedexekirinê xist dewrê û di derheqa Weşanxaneyê Çarçirayê de dawe vekir.

Ev cara yekem e ku program û biryar û rapora politîk ya hêzeke siyasî li Bakurê Kurdistanê bi awayekî eşkere tê çapkirin. Hewildana çapkirin û belavkirina wan, perçeyekî girîng a xebata meşrûkarîna dîtinê siyasî yê rêxistinên Kurdistanê Bakur e.

## Wefteke YEKBÛN'ê çûn seredana Enstîtuya Kurd

Fransa- Di roja 23'ê Çiriya Paşîn de wefteke YEKBÛN'ê ya ji 4 kesan pêkhatî Enstîtuya Kurd li Parisê ziyaret kir. Bi serokê Enstîtuyê, birêz Kendal Nezan re serî û nîvêkê li ser kar û barên Enstîtuyê û rewşa siyasî ya Kurdan sohbet hatê kirin û di warê Kongreya Duyemîn a YEKBÛN'ê de agahdarî hat dayin.

Hevdûdûm di hawayekî samimî û dostane de derbas bû.

## Civîna agahdariyê

Fransa- Di dawiya meha Çiriya Paşîn de li Parisê, nûnerên Partiya me di derheqa Kongreya YEKBÛN'ê ya duyem de agahdarî dan. Gelek heval û dostên welatperwer, nûnerên hêzên dost û kesên serbixwe beşdarî vê civînê bûn.

Nûnerên YEKBÛN'ê li ser rewşa îroyîn a Kurdistanê rawestiyân û bi vê re rewşa YEKBÛN'ê û biryarên di Kongreya duyemîn de hatine wergirtin, anîn zimên; wezîfeyên girîng ên li pêşiya Partiya me şirove kirin û ehemiyeta yekîtiya li pêşiya me (ya di navbera YEKBÛN, TSK, KUK, KAWA û TS) diyar kirin. Beşdarên civînê di beşa pirsan de, bêtir li ser pirsên yekîtiyê rawestiyân û piştgiriya xwe ji bo yekîtiyê anîn zimên û helwesta YEKBÛN'ê ya di warê pêkanîna yekîtiyan de, hêjayî pesinandinê hate dîtin.

Ev cara yekem e ku li Paris'ê ji raya giştî re civîneke weha vekirî ya agahdariyê ji aliyê YEKBÛN'ê ve tê amadekirin.

## Komîteya Yekîtiyê ava bû

Swêd- Rêxistinên KAWA, RNK, TS, TSK û YEKBÛN yê li Swêdê, piştî biryara Yekîtiya siyasî û rêxistinî ya her pênc hêzên ku di meha Çiriya Paşîn de hatin ba hevdû, bi navê "Komîteya Yekîtiyê li Swêdê" komîteyeke hevbeş ava kirin.

Komîteyê di civîna xwe de, serok û sekreterek hilbijart û ji bo xurtkirina têkiliyên di nava hêzan de û pêwistiyên rojane yê têkoşînê hin biryar girt. Hin ji biryarên Komîteya Yekîtiyê li Swêdê ev in:

-Li hember bûyerên siyasî helwesteke hevbeş tête wergirtin.

-Di komeleyên demokratîk de hevkarî têtekirin.

-Bi hevdû re şev, panel, meş, civîn û aktîvîteyên hevbeş tîn amadekirin.

Aktîvîteyên pêşîn ên Komîteyê, amadekirina şevkê bû. Bi vê munasebetê, di 26'ê Çiriya Paşîn de, li Stockholmê şeveke hevnaşîn û şahiyê hat amadekirin. Di şevê de Birader ji kilmên Kurdî konserek pêşkêş kir.

## Dûmahîka nivîsan

### Yekîtiya Sosyalîstan gav bi gav tê hûnandin

teweyî jî dike. Ji bo çareserkirina vê pirsê jî berpirsiyariyên dîrokî dikevin ser milên hêzên sosyalîst. Ji bo bicîhanîna vê berpirsiyariyê jî yekîtiya rêxistinî û siyasî ya sosyalîstên Kurd pêwîst e. Serkeftina di vî warî de dê bawerîya ku ji ber tecrûbeyên neyînî yên xebata yekîtiyan qels bûye, bi tesîra xwe ya erîni, ji nuh ve xurtir bike û pêlên hêviyan bilindtir bike. Ji ber vê yekê pêşveçûnê di warê yekîtiya sosyalîstan de tîn holê, bala civakê dikşîne û civaka me îro ji bo pêkanîna van armancan bi hêviyê mezîn li me dinêre.

Ger sosyalîstên Kurd, bikaribin li gor pêwîstiyên pêvajoyê û berpirsiyariyên dîrokî -bêyî ku tiştên mezîn bikin qurbana yên biçûk- hereket bikin, ji bo ku pêşeroj ne ya wan be tu sedem nîne.

Heta ku sosyalîstên Kurd weha belavbûyî be û balansên civakê li şûna xwe rûneşîbte, wek ku li jor jî hat diyarkirin, serkeftina di warê yekîtiya hêzên neteweyî yên Bakurê Kurdistanê de jî gelek zehmet e. Em bawer in ku hereketê yekgirtî ya sosyalîstan dê di warê yekîtiya hêzên neteweyî de jî tesîreke mezîn li pêvajoyê bike. Sosyalîstên Kurd dê bi riya avakirina yekîtiya xwe reşbîniya (peşmîzma) di

warê yekîtiya hêzên Kurd de jî biçîne.

Ji bo bicîhanîna berpirsiyariyên dîrokî û ji bo ku sosyalîstên Kurd bikaribin di civakê de rola xwe bileyizin, divê her kadro û hêzên ku xwe sosyalîst dibînin û pîrsa yekîtiya sosyalîstan mîna pîrseke xwe dibînin, bi yek navî û di bin şemsiyeya yek rêxistinê de bibin yek û vê belavbûnê jî ortê rakin. Yên ku pîrsên wan ên yekîtiyan tunene jî xwe-diyê azadiya bikaranîna vî mafî û wer-girtina helwesta xwe ya taybetî ya di vî warî de ye. Lê li gor me, pîrsa yekîtiya sosyalîstên Kurd nehatiye çareserkin. Îddiyên li dijî vê, bi rastîya jiyane re li hevdu nakin û ji ber vê yekê, dê nikaribe berpirsiyariyên ji ber karaktera pêvajoyê derdikevin holê, bi cih binin.

Platforma me di vê baweriyê de ye ku hem di vê pêvajoya amadekirina şertên yekîtiyê de û hem jî piştî avakirina yekîtiyê, dê di gellek waran de munaqeshe bêne domkirin. Em vê, li pêşîya yekîtiyê wek astengê nabînin. Em beriya hertiştî, li ser programeke siyasî li hevdu dikin. Lihevdukirina li ser programê, ya herî esas e. Lê em baş dizanin ku divê ev muşterek bi gavên muşterek ên din re bê xurtkirin û pêşdebirin. Wek ku di pêvajoya amadekirina şertên

her yekîtiyê de tê munaqesekirin, divê ahenga di navbera kadroyan de nebe pîrsa esasî ya yekîtiyê. Gellek caran di nava eynî rêxistinê de, di navbera wan kesên ku bi dehsalan bi hevdû re xebat kirine de jî problem derdikeve. Di nava yekîtiya ku li ser bîngeha senteza tradîsyon û mîrasa 30 salên dawî yên xebata siyasî ya Bakurê Kurdistanê bilind dibe de, derketina pîrsên di vî warî de gellek normal e. Di vî warî de misogerîya me, tolerans û demokrasiya hundur a rêxistinê ye.

YEKBÛN di warê yekîtiya sosyalîstan de gaveke dîrokî ye; gavek ku xwe ji despêkê de bi sînor nekiriye. Partiya me di pêvajoya xebata xwe ya sê-salî de bi samîmiyet û qerarbûna xwe ya di warê yekîtiyan de xwe daye îspat kirin. Ji ber vê, di civakê de Partiya me mîna hereketê yekîtiyê hatiye nîrxandin. YEKBÛN di warê peydakirina kultureke siyasî ya nuh, amadekirina perspektîfên bi karekera pêvajoyê re lihev-kirî û bi demokrasiya fireh ya hundurîn xizmeteke mezîn kiriye. Partiya me dê ji bo yekîtiya sosyalîstan ya ku şertên wê gav bi gav tê amadekirin, ji tu berpirsiyariyan nêre ve û ji bo serkeftina vî karî, wê ji her babet fedekariyê re amade be.

### Vatiniyên ku li benda me ne

Raya giştî ya Ewrûpayê agahdar bike û wan tîxe hereketê, herweha tesîrê li ser dezgeh û dewletên Ewrûpî bike. Ji bo vê mirov li kîjan dewlet û bajarên Ewrûpî dibe bila bibe, gelek tiştên ku divê mirov bike, hene. Ev kar dikarin bi riya komele, însiyatîf, rêxistin û komîteyên ku em endamê wan, dilxwaz an nasê wan in, bînin. Mirov bi pêşniyar û bi biryardariya xwe, dikare der û dora xwe bêtir motive bike û wan bixe hereketê.

Mirov dikare van karan bike; Komîteyên kampanyayê li hember zulm û dewleta Tirkîyê û piştgiriya gelê Kurd ava bike û divê ev komîte li gor armanca xwe aksiyonan li dar bixe. Bi kes an dezgehên eleqeder re têkilî deyne û wan ji rewşê agahdar bike û piştgiriya daxwaz bike. Mitîng, xwepêşandan, pankartvekirin, belavok, di rojnamên Ewrûpî de meqale nivîsandin û hwd.

Karê sereke yê vê demê kampanyaya li dijî turîzma Tirkîyeyê ye. Kongreya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê, Komîteya Ewrûpayê ya nuh hîlbijartî jî li ser vê pîrsê bi girîngî rawestîya û hin biryar girt. Beyana encama Kongreya Duyem a Komîteya Ewrûpayê, li ser boykotkirina turîzma Tirkîyeyê weha dibêje: "Ji bo ekonomîya şer ya dewleta Tirk bê qelskirin, Kongreya me, li

*hember turîzma Tirkîyeyê biryara vekirina kampanyayê xurt da. Em civata Kurd li Ewrûpayê di wê hêzê de ne ku bi awayên cûr be cûr yê informasyonê tesîreke mezîn li Ewrûpiyan bikin ku ew neçin Tirkîyeyê. Sala çûyî me Kurdên li Ewrûpayê îspat kir ku em dikarin yek ji çavkaniyên aboriya Tirkîyeyê, yanî turîzmê qels bikin. Em îsal dikarin vê kampanyayê ji par xurttir bimeşînin. Heta havînê divê karê sereke yê her ferdekî/ferdeke civata Kurd li Ewrûpayê, protestokirina turîzma Tirkîyeyê be."*

Yek ji erkên vê demê jî angajekirina tevgera humanîter û demokratîk ya Ewrûpiyan e. Ger em bikaribin vê

vatiniyê bi cih binin, wê gavê dê tevgera humanîter û demokratîk di biryargirtina pîrsa yekîtiya gumrukê bi Tirkîyê re tesîreke mezîn li endamên Parlamentoya Ewrûpayê bikin. Konseya Wezîran a Yekîtiya Ewrûpayê bi hin şertan ve be jî biryara yekîtiya gumrukê bi Tirkîyê re îmze kir. Nuha biryara esasî wê ji aliyê Parlamentoya Ewrûpayê bête dayin. Ji bo deriyên Ewrûpayê li Tirkîyeyê destbixwîn venebe, bi endamên parlamentoya Ewrûpayê re têkevin diyalogê, wan ji rewşê agahdar bikin, bi partî û rêxistinên wan re têkiliyan deynin. Guherandinên pêwîst yên ji bo azadiya huwiyeta me ya neteweyî bi her mafên tabî çî ne, divê ji wan re bînin îzahkirin.

### YEKBÛN'ê Nafîn Baksî pîroz kir

**Stockholm-** Komîteya YEKBÛN'ê ya Swêdê bi delegasyonêke ji sê kesan pêkhatî, li Parlamentoya Swêdê Nafîn Baksî ziyaret kir û parlementerîya wê pîroz kir.

Wek tê zanîn di hîlbijartina giştî ya Swêdê ku 18'ê îlonê de çêbû de, keçeke Kurd Nafîn Baksî jî listeya Partiya Sosyaldemokratîk bû parlementer. Ji bo pîrozkirin û hevdûnaskirinê, li ser navê Komîteya YEKBÛN'ê ya Swêdê şandek (weftek) ji sê kesan pêkhatî Nafîn Baksî li odeya wê ya Parlamentoyê ziyaret kirin û parlementerîya wê bi destek gul û bi hêviyên serkevtinê pîroz kirin. Di ziyaretê de li ser rewşa siyasî ya Kurdan, rewşa civaka Kurd li Swêdê û bi giştî rewşa siyasî ya Swêdê hat peyivîn.

# Daxuyaniya Kongreya Duyem ya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê

Kongreya Duyem ya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê di meha Çileyê Paşîn a 1995'an de civiya. Kongreyê li ser rapora xebata du salan, raporên xebatê yên Komîteyên welatan û raporên Komîteyên kar munaqeshe kir; ji bo du salên pêş programa xebatê amade kir; li ser kar û barên YEKBÛN'ê li Ewrûpayê hin biryar girtin û ji bo Rê-xistina Ewrûpayê destûreke taybetî amade kir.

Kongreya Rêxistina me ya li Ewrûpayê teqabulî rewşeke gelek xerab a siyasî ya gelê me kir. Kurdistana Bakur, ji roja Cumhuriyeta Tirkîyê ava bûye û vir de, di rewşa xwe ya herî xerab de dijî. Du hezar gund hatine valakirin, bi hezaran gund nîv-vala bûne; li dor 3 milyon Kurdan koç kirine, ciyên xwe guherandine. Di van du salên dawî de şoreşger, welatparêz û demokratên Kurd, cînatyên bi navê "qisas ne diyar" di kolanên bajaran de, bi îşkenceyan, di qereqolên polis û cendirmeyan de hatin kuştin. Xwînrijî û zordariya dewleta Tirk a li ser gelê me, sînorên hovîtî û barbariyê ji zû ve ye derbas kiriyê. Dewlet di dijminahiya gelê me de qîma xwe bi qanûnên xwe jî nayne, di şer û êrişên li hember gelê me de tu qaîdan nas nake; avayi-yên HADEP'ê, rojnameyên Kurdan bombe dike, dest dide ser belavkirina wan, parlamenterên Kurdperwer ku bi dengê gel hatine hilbijartin, bi çend mahkemeyên şiklî digre, ceza dike...

Mixabin ev hemû kiryarên dewletê di "sîstema nuh ya dunyayê" de jê re dimînin. Hin biryarên Parlamentoya Ewrûpayê, Yekîtiya Ewrûpayê û Kongreya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li hember kiryarên dewleta Tirkîyê sivik tî. Bê şik ev biryarên hêja ne, lê têrî rawestandina êrişên dewleta Tirk ku bi tanq û top û nîv milyon leşkerên xwe ve ketiye ser dilê geleki bê parastin, nake.

Kongreya Rêxistina Ewrûpayê li hember van kiryarên dewleta Tirk û bêpaxafiya Ewrûpayê, bédeng

mayina civata Kurd ya li Ewrûpayê kêmasiyek mezin dibîne. Herçiqas di vî warî de hin deng bilind dibin jî, ji ber perçe-perçe ne û armanc û uslûba wan ne bi îsabet in, encamêkê bi dest na-xin. Kongreya rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê bangî hemû rêxistin, komeleyên demokratîk, însiyatîfên civakî dike ku li ser esasê berjewendi-yên gelê Kurd, tevgerên acil û hevbeş li hember dewleta Tirk bikin; raya giştî ya Ewrûpayê rakin ser piya.

Îro, li Ewrûpayê pir-hindik Kurd bi rêxistin in, ji hezarî bêtir komele, însiyatîf û komîteyên Kurdan, li her welatî komîteyên hevbeş yên ji Kurdan û xelkên wî welatî, hene. Her komîte, komele, rêxistin li gor xwe têkilî û tesîra xwe heye. Dema ev rêxistin bi kampanyeke hevbeş, bi hemû hêza xwe li hember qetlîama dewleta Tirk rabin, wê raya giştî ya Ewrûpayê jî rake ser piya, li hember Tirkîyê di helwestgirtina partî, dezgeh û dewletên Ewrûpî de jî tesîreke baş bike.

Wê demê em li benda çî ne? Musibeteke weha giran tu carî nehatiye serê gelê me. Em nuha bi hemû hêz û taqeta xwe dengê xwe bilind nekin, emê kîngê bikin?

Ji bo ekonomiya şer ya dewleta Tirk bê qelskirin, kongreya me, biryara vekirina kampanyayeke xurt li hember turîzma Tirkîyê girt. Em civata Kurd li Ewrûpayê di wê hêzê de ne ku bi awayên cûr bi cûr yên înforsiyonê tesîreke mezin li Ewrûpiyan bikin ku ew neçin Tirkîyê. Sala çûyî me Kurdên li Ewrûpayê îspat kir ku em dikarin yek ji çavkaniyên aboriya Tirkîyê, turîzmê qels bikin. Em îsal ji par xurttir dikarin vê kampanyayê bimeşînin. Heta havînê divê karê sereke yê her ferdekî civata Kurd li Ewrûpayê, protestokirina turîzma Tirkîyê be.

Kongreya YEKBÛN'ê girîngiyeke mezin da ko-varên wek Kurdistan Heute, Kurdistan Focus, Kurdistan Nytt û hwd ku bi zima-

nê Ewrûpî dertên û piştgiriya mafên netewî yên gelê Kurd dikin.

Kongreya rêxistina YEKBÛN'ê di warê xizmeta civata Kurd li Ewrûpayê de hin biryar girtin. Di xizmeta civakî de karên herî sereke rêxistina civata Kurd e. Di vî warî de Kongreya Duyem ya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpa biryara xwe ya Kongreya Yekem dubare kir ku bi her awayî wê bixebite li her welatê Ewrûpayê federasyonên komeleyên demokratîk yên Kurdan bêtir avakirin. Ji bo bicihhatina vê wê piştgiriya însiyatîfên heyî bêtir kirin, li welatan ku însiyatîfên weha tunebin û hêza wê dest bide, wê bibe însiyatîfger. Herweha YEKBÛN wê bibe piştgir ku xwendevan, karkir, hunermend û nivîskar rêxistinên xwe yên taybetî û dezgehên netewî ava bikin.

Li Ewrûpayê hejmareke mezin a ciwanên Kurd heye. Kongreya Rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê xaleke programa xebata xwe de, da diyarkirin ku wê bi propoganda û têkiliyên xwe ve bibe piştgir ku ciwanên Kurd bixwînin û xwendina bilind bikin.

Kongre li ser xurtkirina karên rêxistinî yên YEKBÛN'ê li Ewrûpayê jî bi hûngilî rawestiya. Xurtbûna YEKBÛN'ê misogeriya parêzgeriya berjewendiyên gelê Kurd e. Xurtbûna rêxistina YEKBÛN'ê li Ewrûpayê bi awakî giştî xurtbûna Partiya Yekbûyî ya Gel a Kurdistanê ye. Bi vê perspektîfê Kongreyê di warê xurtkirina rêxistina YEKBÛN'ê de hin armanc tesbît kirin û biryar girtin.

-Bijî têkoşîna netewî û civakî ya gelê Kurd!

-Bijî YEKBÛN!

06.02.1995

**YEKBÛN**  
**(Partiya Yekbûyî**  
**ya Gel a Kurdistanê)**  
**Komîteya Ewrûpayê**